Bidestveanîna mafên neteweyî yên gelê Kurd di çarçoveya Îranek Demokratîk û Federal de

Hejmar: 107
15’ê Adara 2009
Buha: 150 Tûmen

agiri

Duheftînameya siyasî, civakî, çandî û hunerî
Partiya Demokrat ya Kurdistana Îranê diweşîne

**63’mîn Salvegera Avabûna Yekîtiya Jinên Demokrat yên Kurdistanê Hate Pîrozkirin**
Rûpela 2



**Nûçegihanên Bêsînor:**

# “ÎRAN DUJMİNÊ YEKEM YÊ ÎNTERNETÊ Dİ ROJHİLATA NAVÎN DE YE”



Rêxistina Nûçegihanên Sînornenas roja pêncşem, 12.03.2009’an, li Berlînê raporek belav kir û Îran weke dujminê yekem yê Înternetê di Rojhilata Navîn de da nasîn. Di rapora han de ku bi hinceta Roja Cîhanî a Xebat li dijî Sansorê hate belavkirin, welatê Çînê weke dujminê sereke yê Înternetê di cîhanê de hate diyarîkirin.

Komara Îslamî berdewam wêblagnivîsan binçav dike. Li gor daxuyaniya fermî ya Rojnamevanên Sînornenas, di sala 2008’an de, 5 milyon malperên Înternetî hatine fîlterkirin.

Rêxistina Nûçegihanên Bêsînor di rapora han de, 12 welat di cîhanê de weke dujminên Înternetê nasandine, welatên han ev in: Çîn, Îran, Sûriye, Erebistana Seûdî, Kuba, Bêrme, Kereya Bakûr, Tûnis, Turkemenistan, Ozbekistan û Viyetnam.

Nûçegihanên Bêsînor diyar dike, welatên han bi astengkirina Înternetê nahêlin destê xelkê bi zanyariyên dilxwaz ên wan rabigihîje. Di van welatan de, sansora Înternetê bi hêceta parastina ewlehiya neteweyî, berjewendiyên olî yan parastina mafên kêmneteweyan birêve diçe.

Li gor rapora Rêxistina Nûçegihanên Bêsînor, şîrketên mezin yên Înternetî weke Google, Yahoo yan Microsoft, di hinek ji wan welatan de li hember givaşên dewletan teslîm bûne û di pêvajoya asteng û fîlterkirina malperên rexnegir de beşdar bûne.

# Amerîkayê Dorpêçên Aborî Li Dijî Îranê Bo Salek Din Dirêj Kir



Obama, Serok Komarê Amerîkayê, dorpêçên aborî ên li dijî Îranê bo salek din dirêj kir. Li gor vê biryarê, gemaroyên aborî yên Amerîka li dijî Îranê heta Adara 2010’an dê bên meşandina. Bernama baykut û dorpêçên aborî li dijî Îranê ji sala 1994’an ve tê meşandin.

Armanca Amerîkayê ji van dorpêçane, piştgiriya Îranê ji terorîzmê û xebat ji bo bidestxistina çekên Etomî dizane.

Obama di daxuyaniya roja pêncşem, 13.03.2009’an de, diyar kir ku kiryar û siyasetên dewleta Îranê niha jî ji bo ewlekarî, siyaseta dereve û aboriya Amerîka weke gef tê hesibandin.

Ev dorpêçane şîrketên Amerîkî neçar dikin ku di 4 waran de ji alîkarî bona pêşdebirina seneta petrola Îranê, encamdana dan û stanên ticarî, hatinî û şandiniyê û her wiha sermayedanîn di wî welatî xwe biparêzin.

**Deftera Siyasî A PDKÎ, 8’ê Adarê Pîroz Kir** 2

**Girava Bi Arîşe**



4

**Mêrxasî û berxwedana sê roje ya şerê Ceterê(5)**




5

**8’ê Adarê, Roja Vejiyan û Berxwedanê**



7

**MUZÎK**



9

www.arsivakurdi.org

# Deftera Siyasî A PDKÎ, 8'ê Adarê Pîroz Kir

**Bi henceta 8'ê Adara 2009'an, Deftera Siyasî a PDKÎ daxuyaniyek da çapemeniyê û ew roja cîhanî li hemû jinên cîhanê û Kurdistanê pîroz kir. Deqa daxuyaniya PDKÎ bi vî awayî ye:**

8'ê Adarê, Roja Cîhanî ya Jinan pîroz be

Îro 8'ê Adarê Roja Cîhanî a Jinan e. Bi vê hencetê ve em pîrozbahiyên xwe ên herî germ pêşkêşî jinên Kurdistana Îranê û hemû jinên cîhanê dikin. Jin û mêrên wekhevîxwaz ku îro di pirraniya welatên cîhanê de vê rojê bibîr tînin û rêz digrin, di rastî de piştevaniyê ji daxwazên berheq û demokratîk ên hemû jinan dikin ku di bin zilm û zordarî û cudahîdananên curbicur de tên çewisandin û mafên wan yên herî destpêkî tên binpêkirin. Eva di halekê de ye ku beşeke berbiçav ji welatên dinyayê nemaze di welatên pêşverû ên Rojavayî de, jinan bi nîşandana şiyan û kêrhatîbûna xwe berpirsiyariyên girîng di rêvebirina welat de bidest xistine û bi vî awayî selimandine ku heke perwerdehiya îroyîn û pêkanîna qada wekhevî û dûr ji kêmgirtina û cudahîdanana ji wan re pêk bihê, dikarin mil bi milê mêran di pêşdebirina civakê de berpisiyariyê li stû bigirin û di vê derbarê de ji mêran paşde nemînin. Lewra xisareke mezin e heke nîva nifûsa civakekê ku jin in, nehên berçavgirtin û ji karîn û şiyana wan bona xizmetkirin bi civakê mifah nehê standin.

Serbarê hemû wan rastiyane, mixabin niha jî gellek in ew desthilatdarên ku di dema îro de jiyaneke kêrhatiyê mirov ji bo jinan pêk naînin û weke miroveke derece 2 nahên mêzekirin.

Heta pirr caran jî weke mirov bi wan re riftar û sederî nahê kirin. Rejîma Komara Îslamî yek ji wan cure desthilatdarane ye ku li gor qanûna bingehîn û bi eşkere ji jinê weke mirov nanihêre û ji mafên herî sereke ku lixwekirina kinc û cilûbergên bi dilê xwe ne, bêpar kiriye. Di hember de, jinên netirs û biwêr jî serbarê serkut û bêhurmetîkirinan ji aliyê hêzên tepeserker ên Komara Îslamî, teslîm nebûne û bêrawestan li hember vê rejîmê li dijî vî awayê jiyanê ku rejîmê ji wan re diyarî kiriye, sekinîne û xebat kirine. Hebûna sedan jinên çeleng di warê mafê wekheviyê, mafê mirovan û azadiyê de, di girtîgehên Komara Îslamî, xwenîşandan û girevgirtinê de û bi giştî hemû ew dijkiryarên jinan ku em rojane li vir û wir ya welat dibînin, nîşana vê rastiyê ne.

Di vê derheqê de, qursatiya zilm û stemeke zêdetir ji jinên cihên din ên Îranê li ser milê jinên şiyar ên Kurd di Kurdistana Îranê de ye, ji bilî vê çendê ku weke jin di vê hikûmetê de tên serkutkirin, weke Kurd jî zilm û zordarî li ser wan tê meşandin.

PDKÎ ku zêdetirî 60 salan e ji bo demokrasî û wekheviyê di civaka Kurdistanê de dixebite, bi çavê rêz û hurmetê dinêre hemû ew berxwedan û tekoşîna jinên seranserî Îranê, nemaze jinên Kurd, li hember her êrîşekê ku li ser mafên wan tê kirin, li gor pirensîp û bernameya partiyê ku mafê wekheviya jinan di nava malbat û civakê de pejirandiye, piştevaniyê ji daxwazên demokratîk û wekhevîxwaz ên wan dike. Di roja 8'ê Adarê de em daxwazê dikin ku wisa dike ku jinên rewşenbîr û azadîxwaz bêtirî caran refên xwe xurt û organîze bikin û bi hevgirtina xwe daxwaza mafên xwe bikin û pêşberî kirêgirtiyên xedar ên rejîma Komara Îslamî rabiwestin û tekoşînê bimeşînin.

Serkevtî be xebata jinan ji bo bidestveanîna mafên wan ên rewa.

**Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê**
**Deftera Siyasî**
**8' Adara 2009'an a Zayînî**
**18'ê Reşemeya 1387'an a Rojî**

# 63'mîn Salvegera Avabûna YJDKÎ Hate Pîrozkirin

Seet 15'ê piştînîvroya roja şemî, 14'ê Adara 2009'an, bi henceta rêzgirtin ji 63'hemîn salvegera avabûna Yekîtiya Jinên Demokrat yên Kurdistana Îranê, bi beşdariya endamên rêberiya PDKÎ, endam û Rêveberên YJDKÎ û sedan kes ji Kadr û Pêşmerge û jinên xebatkar, rê û resmeke hêja û berfireh hate lidarxistin. Şahî bi sirûda netewî a Ey Reqîb û deqîqeyek bêdengî bona rêzgirtin ji canê paqij yê şehîdan dest pê kir.

Ji aliyê pêşkêşkarên rê û resmê, **Şeyda**



**Kemanger** û **Selîm Zencîrî** ve bixêr hatina hemû beşdar û mêvanan hate kirin. Piştre ji aliyê kekê **Rostem Cehangîrî**, endamê Deftera Siyasî ve peyama Polîtbîroya PDKÎ bi vê hincetê ve hate pêşkêşkirin. Dûre sirûdek bi navê 'Jin di kar û xebatê de' bi alîkariya Koma Sirûda Yekîtiya Jinan ve pêşkêşî beşdaran hate kirin ku coşek taybet da şahiyê.

Di doma bernameya rê û resmê de, Peyama YJDKÎ, ji aliyê **Çinûr Qadirî**, endama Desteya Kargêr a Yekîtiya Jinan ve bi vê hilkevtê hate xwendin. Bi dengê zelal û xweş ê qîza ciwan **Çiro Sohrabî** stiranek xweş hate pêşkêşkirin û coş û xemlek taybet da şahiyê. Beşdaran bi çepikan pêşwazî ji vê keça dengxweş kirin.

Paşan peyamên Yekîtiya Ciwanên Demokrat yên Kurdistana Îranê ji aliyê **Jiyar Qadirî** û peyama Yekîtiya Xwendekarên Demokrat yên Kurdistana Îranê jî ji aliyê **Sefye Mehmûdî** ve hatin xwendin. Di beşek din ji rê û resmê




de jî stranek xweş bi zaraveya şirîn a Hewramî bi dengê zelal yê Hunermendê Pêşmerge, **Xulam Fatihî** pêşkêşî beşdaran hat kirin.

Herwha çendîn peyamên pîrozbahiyê ji aliyê komîteyên jinan ên ser bi rêxistina YJDKÎ ve hatibûne şandin ku ji ber kêmiya demê tenê îşare bi navên wan hate kirin. Beşa dawî a pîrozkirin û rêzgirtin ji 63'hemîn salvegera avabûna YJDKÎ bi govend û dîlana reşbelek a kurdî bû û bi gerrên dîlanê û kêf û xweşiya beşdaran bi dawî hat.

www.arsivakurd.org

# Pênc Saliya Bûyera Qamişlo Ya Sala 2004'an



**Elî Şemdîn**
**Silêmanî -10.03.2009**

Berî pênc salan, roja 12.3.2004'an, û bi xwînek sar hêzên dewletê yên şovînî û nijadperest, gule wek baranê barandin ber bi hewelatiyên kurd li bajarê Qamişlo, yên ku destvala hatibûn yarîgeha bajêr ku li lîstika fotbolê temaşe bikin, û di encam de nêzîk 30 kurd Şehîd bûn, û bi sedan birîndar û bi hezaran girtî li zîndanan, her wiha bi sedan mal û dukan bi destê hêzên ewlekariyê û endamên çekdar yên Partiya **BEES** hatin dizîn û talankirin.


Wek ku hate eşkerekirin, ev bûyer bi xwe pîlaneke kirêt û rûreş bû ku hatibû bi destên qirêj yên nijatperest û şovîniyên dilreş yên dezgehên dewletê li Herêma Hesekê sazkirin, û yekemîn guleya ku di rûyê hawelatiyên kurd de hate teqandin, bi fermaneke fermî ji aliyê parêzgeha Heasekê (Selîm Kebûl)ve bû, ev karesat hate meşandin, dijî kurdan bi behana nakokiyên ku derketibûn di navbera Tîma Fitiwe ya Herêma Dêrezorê de ku piraniya xelkê wê deverê ji alîgirên rêjîma Sedam Husên bûn, û Tîma Cîhad ya bajarê Qamişlo ku bi piraniya xwe ve kurd in: wan nakokî dest pê kiribûn piştî ku tîma Fitiwe silogan û dirûşmên nijadperestî hildabûn, ku digotin: bijî Sedam, û bimre serkirdayetiya kurd li Kurdistana Îraqê, û didîtin ku kurdan rêjîma Sedam rûxandiye, lewra lîstika fotbolê kirin behane ji bo tolsitandin û heyfhilandinê ji kurdên Qamişlo, û dezgehên Şovînî jêre amade bûn ku netewa kurd bi kuştin û birîndarkirin û zîndankirin û talankirinê çavtirsandî bikin, da ku nehêlin kurd kêfxweş û dilrehet bibin bi serkevtinên Kurdistana Başûr, lewma diyar bû ku ewan xwe bi hevre amadeyî vê pîlanê kiribûn ku di Yarîgeha Qamişlo de biteqînin.

Mixabin, hawelatiyên Qamişlo yên ku bi piraniya xwe kurd in, ji vê pîlanê bêagah bûn, lewra yên çûbûn yarîgehê tev destevala bûn, tenê çûbûn li lîstika fotbolê temaşe bikin û piştgiriya tîma xwe bikin, lê berî lîstik dest pê bike, pîlan dest pê kir û gule li hevwelatiyên kurd hate reşandin û laş li erdê hatin raxistin û nexweşxane ji birîndaran hatin dagirtin û bi hezaran li zîndanan bûn mêvan ..

Raste vê pîlanê hin ji armancên xwe cîbicî kirin, ji kuştin û talan û zîndankirina bi hezaran kurd û gurrkirina agirê nakokî û nijadperestiyê di navbera kurd û ereban de, û her wiha geşkirina hesta şovînî li cem beşek ji civaka Erebî, ku digotin kurd parçebûna Sûrî dixwazin, û xeter in li ser welat û hevalên Amerîka û Îsraîlê ne û wd… van derewan ku li ser devê berpirsên dewletê yên bilind û piçûk dihatin di nav civaka Erebî de belav kirin, lê ciyê dilxweşiyê ye ku gelê kurd bi serokatiya tevgera xwe ya siyasî bi yekdestî û yekdengî li pêş vê pîlanê bi xurtî sekinîn, û ew pîlan dane hilweşandin û netewa xwe ji kareseteke mezin dane parastin, û gellek zû armancên vê pîlana kirêt eşkere kirin û ji raya giştî re tazî û pirotesto kirin: Kurdan li herêmên din û li hemû deverên ku lê dijîn, bi xurtî piştgiriya kurdên Qamişlo kirin û di hawara wan de rabûn. Bi sed hezar kesan li dijî vê kareseta ku li dijî kurd hate meşandin xwepêşandan kirin, her weha xelkên Ereb û Aşûrî jî ev pîlan pirotesto kirin û li dijî sekinîn ..

Û li cem raya giştî baştir hate naskirin ku pirsa kurdî li Sûriyê, dozeke nîştimanî ye û divê bi riyên aştî û demokratîk were çareserkirin, ne bi kuştin û girtin û talankirinê .. û rêjîma Sûriyê bi xwe jî tê gihîşt ku divê ev pîlan were sekinandin, ji ber ku encamên vê pîlanê li wan vegeriyan, lewma serokê dewletê eşkere kir ku netewa kurd li Sûriyê beşekî nîştimanî ye ji welatê Sûriyê ..

Niha pênc sal li ser vê karasetê derbas dibin, lê tawanbarên ku ev pîlan bi eşkere bikar anîn, hîna jî azad in û dûrî dagehê ne, û di dema ku gelê kurd çavnêr bû ku rêjîm li ser pirsa kurdî bisekine û bi rengekî demokratîk û aştiyane çareser bike, em dibînin ku siyasatên wê li dijî kurd tûj û tunditir dibin, ji alîkî ve ew pirojeyên şovînî mîna serjimêriya 1962, Zinara Erebî ya 1966 û wd berdewam in, û ji aliyê din ve jî hin pirojeyên din li dijî kurd didine meşandin, mîna biryara 49 ku kirîn û firotinê li herêmên kurdî dide sekinandin û dergehê jiyanê li ber kurd dide girtin, her weha astengiyan li ber kurd dide peydakirin û jiyana wan reş dike..





Mafê Mirovan



Nivîsîn: Peter R. Baehr *
Wergeran: Mecîd Heqî

# Rola Mafê Mirovan Di Siyaseta Dereve De

### *Xwe parastina Dewletê*

Mafên bingehîn û azadî hewcehiya xwe parastina dewletê li pêpeskirina mafên takekesan dixwaze. Dewletê mafê îşkencê nîne û nabe rê bide karbidestên wê, wî karî bikin. Ew nabe pêşiya serbestiya saziyên xelkê, xwenîşandan û civînên wan bigre; ew nabe pêşiya serbestiya ragehandin û azadiya gotinê (beyan) bigre.

Lê ewa hemû çîrok nîne.

Hinek caran dewlet diviya hin karan bike daku serbestî û mafên mirovan bên misogerkirin û di rastî de bên rahênan û perwerdekirin.

Bo mînak mafê hebûna dadgahek dadperwerane demekê tê cîbicîkirin ku dadwerên xwedî perwerde û bi ezmûn hebin daku bikaribin dadgehek dadperwerane birêve bibin û hewce ye karbidestên edliyê (dadgehê) xwediyê teknîkên pêwîst bona cîbicîkirina dadgehê hebin. Carna serbestiya xwenîşandan û civînên li dijî rikeberên siyasî dikaribe tenê di bin sîbera parastina polîs de birêve biçin.

Mafê beşdarî li dewleta welatê xwe "rasterast an ji rêya nûnerên bi serbestî hatin hilbijartî" (Carnameya Gerdûnî ya Mafê Mirovan, benda 21), daxwazê ji dewletan dike bo rêxistina azadiya serbest û dengdanên nepenî, îmkanatên perwerdeyî, pirtûkxane û hewcedariyên din bi awayê asayî diviya ji aliyê dewletê ve bên cîbicîkirin.

Bi gotinek din, xweparêziya tenahî ya dewletê ji bo misogerkirina maf û serbestiyan têra nake. Berevajî wê renge rast be.

Di warê mafên civakî û aborî de, hewcehiya beşdariya dewletê hîn zêdetir e. Cîbicîbûna mafên wek mafê kar, mafê perwerde, mafê nojdar û derman, mafê tenahiya civakî bê beşdarî û yasayên dewletî nikaribin bên hizirkirin.

Belkî cudahiyên ramanên ramyarî li ser asta beşdariya dewletê di wan mafane da hebe, lê hizra sedsala 19'an ya "dewleta parêzerê şevan" an bi Kurdiya wê dewleta ku tenê hukmî li ser civakê dike, mirî ye.

www.welatekurd.org

**RONÎ**

Quncikek ji bo şiroveya bûyer û babetan ji xwendevanên "Agirî" re

**Ebdullah Hicab**



# Girava Bi Arîşe

Kuştina 2 serbazên Birîtanî û li pey re jî polîsekê li Bakûrê Îrlandê di wan çend rojên dawîn de, ji bo carek din mijara tundûtûjiyê li Îrlandê xiste rojevê. Civaka du perçe ya Îrlandê piştî dewranek pirr ji dijwarî di navbera salên 1969- 1997ê ku têde 3 254 kes bûne qurbanî, ji sala 1998ê ve ketibû pêvajoya lihevhatin û aramiyê. Niha tê meraqkirin ka gelo dê ev kuştin çi bandorekê li ser pêvajoya aştiya herêma Îrlanda Bakûr danê, û 1,6 milyon hevwelatiyên Îrlandî dê bi çi rengî xwe ji encamên vê bûyerê xelas bikin.

Di dîroka hevçerx de, ji bo cara yekê Îrland sala 1921'an hate perçekirin. Dema başûrê welat di sala 1922'an de serxwebûna xwe ragihand, hukûmeta Londonê bi awayekî fermî kontrola her 6 parêzgehên bakûrê welat girte destê xwe û rê neda ku ew 6 parêzgeh tev li komara nûavabûyî ya Îrlandê bibin. Hêceta Londonê ji bo wî karî, têkiliyên dîrokî yên wê beşa Îrlandê bi Londonê re bû, ku ji ber hebûna hevwelatiyên Protestan di herêmê de, berjewendiyên xwe ji berjewendiyên Îrlandiyên bi ola xwe Katolîk re cuda dihesiband.

Kêşeya Îrlandê, ji dîroka serxwebûn û perçebûna Îrlandê kevintir e, û diçe ser arîşeya dîrokî ya di navbera Katolîk û Protestanên girava Îrlandê de ku herî kêm 300 sal kevn e. Îrlanda ku ji sedsala 6ê ya piştî zayînê ve ola Mesîhî û mezhebê Katolîk pejirandibû, sala 1690 bû meydana şerê di navbera Şah Williamê III yê Îngilîz ji silsileya qiraliyeta Orange – Nassau û Jamesê II yê Katolîk yê Îrlandî. Li pey wî şerî re, komela Protestan li Îrlandê ciyê xwe kir û beşeke desthilatê li beşa bakûrê Îrlandê girte destê xwe. Serkevtina William di wî şerî de, ji aliyê Protestanan ve weke bûyerek dîrokî tê nirxandin û her sal di salvegera wê serkevtinê de, meşa şahiyê ku bi meşa pirteqalî yan Orange-order tê binavkirin, birêve diçe û dibe hegerê aloziyê di navbera Katolîk û Protestanan de.

Ji wê demê ve her du civakên Katolîk û Protestan bi hev re, lê bi netifaqî û alozî jiyan derbas kirine. Lê piştî serxwebûna Îrlandê û daxwaza hevgirtina giravê ji aliyê Katolîkan ve ew alozî kete qonaxa tundtûjî û bizevên tundajo yên dijberî hev li hember hev de sekinîn. Ji her du grûpên dijber, Katolîkên Roman ku weke alîgirên rêbaza neteweyî an nasyonalîst tên naskirin, xweziyarê hevgirtin û yekparbûna Îrlandê ne. Yekîtîxwaz an "Unionist" ku piranî Protestan in, alîgirê mana di bin sîvana Îngilîstanê de ne. Yekîtîxwaz ku di herêmê de weke "Ulstermen" tên naskirin, li ser wê baweriyê ne ku tenê London a bi wan re xwediyê heman ol û baweriya dînî dikare ewan û berjewendiyên wan biparêze. Alîgirên rêbaza neteweyî an nasyonalîst xwe bi Îrlandê re bi yek netewe dihesibînin.

Digel aloziyên li navbera grûpên dijber, hem Îngilîstan û hem jî Îrland ketin hewla avakirina hevbendiyan û grûpên bi xwe ve girêdayî ava kirin. Rêşxistinên Protestan ketin nava hevbendiya bi Londonê re û grûpên hevgirtinxwaz bi Dublînê re têkiliyên xurt danîn. Partiya ji eslê xwe çepgir ya Sinn Fein (Xweybûn an Em bi xwe) ku sala 1905 hatibû avakirin, li pey serxwebûna Îrlandê re xwe û armanca xwe guhert û kete ser rêbaza neteweyî. Sinn Fein êdî bû heval û hevbendê sereke yê Dublînê li hember Londonê de. Lê hevbendiya partiyê bi Artêşa Komarîxwaz ya Îrlandê (IRA) re, rewşa Sinn Feinê guhert û hevalbendiya eşkere di navbera wê û dewleta Îrlandê de pirr zehmet kir.

Lê bi dijwariyên li ser rê re jî, hêj Dublînê hêviya hevgirtina bi Belfastê re ji dest neda. Welatê perçebûyî bi her awayî têkiliyên xwe yên siyasî, civakî û kultûrî parast. Sala 1937 Parlemana Îrlandê yasayek bingehîn ya nû pejirand û siyaseta xwe ji bo hevgirtina Îrlandê eşkere kir. Ew yasa Bakûrê Îrlandê weke beşek ji axa hevbeşiya welatê Îrlandê dihesibîne û hevgirtina welat ji xwe re bi armanc digre.

Li hember de Îngilîstanê jî hin derfet ji Îrlanda Bakûr re afirandine. Her çend Îngilîstan Bakûrê Îrlandê weke yekîneyek serbixwe an cuda nahesibîne, lê ji sala 1920 û pê ve, rê daye ku Bakûrê Îrlandê xwediyê statuyek xweser be û hukûmetek xwebirêveber ava bike. Ev hukûmeta herêmî kêm - zêde heya destpêka dehiya 60 ya sedsala 20ê, her 6 parêzgehên Bakûra Îrlandê birêve dibir, lê ji wê demê û pê ve bi dijwariyan re rûbirû bû. Kêşeya navbera Protestan û Katolîkan roj bi rojê xurt bû û bû hegerê şerê qewmî ku ji kontrola London û Dublînê derçû. Sala 1969'an arîşeyên herêmê wisan xurt bûn ku hukûmeta herêmê bê tesîr kirin û di piratîkê de karîgeriya wê nema. Li encama bêkêriya hukûmeta herêmê, London neçar ma ji sala 1972 ve rasterast karûbarên Bakûrê Îrlandê bimeşîne û sala 1973 bi yekcarî birêveberiya Îrland a Bakûr hilweşand. Hem grûpên Protestan ku weke baskê çekdar yê hêzên polîs û artêşa Îngilîs dixebitîn û hem grûpên çekadr yên Îrlandî ku piraniya wan di bin sîvana "IRA" de dixebitîn, di şer de tundûtûjiyek bê sînor bi kar anîn. "IRA" meşrûiyeta xwe ji dîroka têkoşîna li hember Îngilîsî û Protestanan digirt û ji ber rola xwe ya di şerê hundir yê Îrlandê di salên navbera 1922 û 23 de, bi germî ji aliyê Dublînê ve nedihat wergirtin. Lê tu car jî bi yekcarî nehat bêçekkirin. Dema rêxistin li hember "Unionist" û leşkerê Biritanî şer dest pê kir, Sinn Feinê xwe jê nêzîk kir û di dawiyê de bû eniya siyasî ya IRAyê. Piştî bi salan şer û alozî, bi destpêşxeriya birêveberiya Clinton li Amerîka û daxwazî û heza Birîtaniya, her sê siyasetvanên Îrlandî Gerry Adams (Sinn Fein), John Hume (Sosial Demokrat) û David Trimble (Ulster Unionist) li hev hatin û pêvajoya aştiyê li Îrlandê pejirandin. Li pey re grûpên çekdar ji her du aliyan bi erênî temaşey pêvajoyê kirin û dema IRA bi fermî pejirand ku tev li pêvajoya aştiyê bibe, hêviya bi dawî hatina şer û tundûtûjiyê xurt bû.

Di encama pêvajoya aştiyê de li sala 1998'an ji nû ve birêveberiya herêmî hat damezirandin û sala 1999 hukûmeta herêmê bi tevlêbûna girûpên sereke ji her du aliyan ve hate ragehandin. Lihevhatina Belfast, ya ku bi navê lihevhatina "Înî ya qenc" tê naskirin, ji sala 1998 ve heya niha çend car bi qebxwaziyê (çalişên) nû re rûbirû bûye, lê dubare xwe girtiye û derfet daye aştiyek mayinde. Îrlanda bakûr ku bi 19 parlemanteran li Parlemana Birîtaniya tê temsîlkirin, xwediyê gellek mafên taybet e. Di encama lihevhatina navbera aliyên pirsgirêkê û her du dewletên Îrland û Birîtaniya Mezin de, hevwelatiyên Îrlanda Bakûr mafê hindê hene ku bi xwe nasnameya xwe ya neteweyî diyar bikin. Yanî her kesê hez bike, bi xwe dikare diyar bike ka xwe weke Birîtanî an weke Îrlandî bide nasandin. Rêkevtinnameya Belfast ya sala 1998 di navbera her du hukûmetên Îrland û Birîtaniya de dibêje: "mafê bê vir de wê de ye her hevwelatiyek Îrlanda Bakûr e ku xwe weke Îrlandî an Birîtaniyayî an xwediyê her du nasnameyan bide nasandin û nasnameya wî/wê weke bi xwe dixwaze bê pejirandin. Lewma her du dewlet (Îrland û Brîtaniya) mafê xelkê Îrlanda Bakûr e ku bi xwe diyar bikin ka dixwazin hevwelatiyê kîjan welatî bin an yê her du welatan bin, bi fermî nas dikin, û guhertina qedera siyasî ya Îrlanda Bakûr di pêşerojê de, dê tu karîgeriyê li ser wê qirarê daneyne". **Dom di rûpela 6'an de...**

www.arsivakurd.org

## Mêrxasî û berxwedana sê roje ya şerê Ceterê

# "Gelî Hevalan, Eger Hûn Çûn, Min Cî Nehêlin"

Beşa 5



**Silêman Keleşî**

Heta niha ku çend hevalên me şehîd û birîndar bûne, lê hêj deng li çek û tivenga çi hevalekî pêşmerge nehatiye. Ji ber ku dijmin gellek derbên qurs ji destê wan Pêşmergan xwaribû, nediwêra xwe bide ser reşê wan. Ewan dixwast bi topbarana xwe hêzên Pêşmergan bitirsînin û perîşan bikin heta ku bi vî awayî hêz û qaweta şerkirinê ji wan bistînin û bikarin bi hêsanî bigîjne armancên xwe ku kuştin û êxsîrkirina hemû Kadr û Pêşmergan bû.

Ez û kekê Hacî Cindî ku niha li bajarê Berlîna Almanya dimîne, ligel du yan sê kesên din bal hev bûn. Wek di beşa pêşîn de bas hatibû kirin, ji ber topbarana bê emanya dijmin rêxistina ku fermanderan kiribû, nemabû. Gellek tîm û kes mecbûr dibûn bona parastina xwe ji destê topxanê cîyê xwe berdin û ji bo cîyê ku bi hizra wan emntir bû hern.

Her çend ku çi cîyê emin di gundê Ceterê de dest nediket. Lê em her di nava gund de digeriyan ku bizanin ka emê bikarin çi bikin û ka kengê hêzên dijmin dê xwe li me nêzîk bikin ku em bikarin tola wê topbaranê ji wan bistînin. Her di wê dema geryanê de, gellek dîmenên ku dil û kezeba mirovan diêşand, ber çavê min diketin ku bi rastî wijdana her mirovekî xwedî wijdan dihejand, ku çawa dijmin bi awayekî hovane ter û hişik digel hev dişewitand. Bi xasmanî xelkê sivîl û bê berevan û zarokên sava û piçûk bi her dengeke top û katyoşa ku li pey hev diteqîyan, zarokan çawa xwe li ber û pêsîra dayikan ve diguvişandin û diqîriyan û tijî ser serê wan toz û dûman dibû. Ewan nedizanîn û fam nedikir ku gelo gunehê wan çîye û çima wiha bêrehmane ew û gundê wan ketine ber agirekî wiha malwêranker. Ew hemû Kadro û Pêşmerge di gund de mane û dijmin derfetê nade ku ew ji gund derkevin.

Me tenê û tenê yek rê heye û ew jî berxwedan û berxwedan. Yan bi şanazî ve şehîdbûn wek hemû şehîdên rêya rizgariya Kurdistanê, yan jî afirandina şanaziyeke din ji bo gelê xwe û wek carên berê di ser leşkerê zaf û heta didanan çekdar yê dijmin de serkevtin.

Dijmin bi keyfa xwe gund û sengerên Pêşmergan topbaran dike. Mixabin çi Îmkana hicûm û êrîşê jî bo ser dijmin nine heta nehên nava gund. Ji ber ku hemû deşta rast e û rûbirûyê topxane û çekên giran ên wan e. Ew hemû hêza me di nava gund de çeper girtine û gellek kesan jî xwe ji bo parastin di malan de veşartine.

Ewa ku ez bizanim, yekemîn şehîdê me **Tofîq Mamedî** bû ku dixwast xwe bigehîne wan hûre milikên (hûre girik) pişta gund. Lê mixabin di nîva rê de kete ber topekî dijmin ku heta şehîdbûnê tu kesî nedikarî xwe bigîjine ser cenazê wî. Ew hevalên ku em bi hev re bûn, em çûne wî aliyê gund ku dikeve aliyê gundê Engîce û Rikava. Çavê min bi **Idrîs Mîrî** ket ku ber dîwarekê senger girtibû heta ku nehêle hêzên dijmin bêne nava gund. Lê mixabin bi gulekatyoşayê birîndar bibû û ketibû ser erdê û xwîn li birînê wî dihat. Rewşa Idrîs baş nebû û birîna wî pirr kûr bû. Lê belê Idrîs bi wan birîna jî hêvîya xwe ji dest nedabû û her fikra jiyan û xebatê dikir û digot: ***"Eger hûn çûn, min bi cî nehêlin!"*** Heta me ew anî ber dîwar, mîna aşekî ku tu avê ser bigrî axîn û xurîna dawiyê lê hat û şehîd bû. Lê hêj jî çavê wî her vekirî bûn. Mirov digot hêj jî her nobedar e û dixwaze bizane kanê kengî dijmin dê bête nêzîk ku ew şer bike. Ew Pêşmergeyekî zîrek û netirs bû.

Me tivinga Idrîs rakir û ser devsa xwe de vergeriyan. Min bi xwe re digot ku wext e careke din Idrîs bike gazî û bêje heval we bo çi ez cî hêlam!? Lê mixabin deng ji Idrîs nehat. Raste ku îdî deng li Idrîs nehat, lê belê piştî 24 salan, îro jî ew deng her di mêjî û serê min de maye ku digot: ***Eger hûn çûn, min çî nehêlin!*** Me nekarî gotina wî bi cî bînin û me ew heval û gellek hevalên din jî bê rih û can cî hêlan.

Em çend pêngavan ku dûr ketin, hevalek hate pêşiya me û got ku **Kamilê Reşo** birîndar bûye. Kekê Kamil xelkê Bakurê Kurdistanê û endamê PSK bû. Ez gellek ketme xema wî û xemgîn bûm. Her çend Kurdistan mala hemû Kurdan e, lê dîsan jî wan sînorên bêbext ku bi dest dijminan hatine danan, kêm û zêde karê xwe kirine. Me ew wek xerîb dizanî. Yan baştir bêjim ku renge wî xwe xerib zanîbe. Ewa qedera şorişgerên kurd û Kurdistanê bûye ku her wextekê eger ronahîyek li cem birayên xwe li parçên dinê dîtibin, bona alîkarî û pêşvebirina wê yekê sînor derbaz kirine û çûne alîkariya birayên xwe. Kamil bi birîndarî li şevê hate xilaskirin, lê mixabin ji ber kûrbûna birînên wî, di nîveka rê de Şehîd bû. Divê bête gotin ku li wan şehîdên gundê Ceterê tenê cenazê Şehîd Kamil Reşo û Şehîd **Mewlûd Ebdullahî** ku di girikê hinda gund de şehîd bû, neketine destê dijmin. Yên din hemû ketne destê dijmin. Cenazê Kamil di gundê Sakan de hate veşartin.

Belê em çend pêngavên dinê meşîyan û me dît ku Serbaz Ebdilî birayê şehîd Miradê Ebdilî xelkê gundê **Kûra Evraz** ku cîranê der bi derê me bûn, şehîd bûye. Îdî bêhana wî nedihat û nediçû û bêdeng ketibû xewa yekcarî û derdora wî bi xwîna wî ya sor hatibû rengînkirin. Lê radyoya wî ya Toşîba ku danîbû ser Radyo Dengê Kurdistanê, her wisa bi dengekî bilind ji bo şehîd Serbaz nûçeyên şerê du rojên berê digot, bê wê hindê ku bizane xwedîyê wê şehîd bûye û îdî nikare dengê wê bibîse. Ew radyoya ku şev û roj wek tivinga Sebaz li milê wî ve bû, ez nizanim piştî Serbaz ew radyo dê milê kî de be û ji bo kê nûçe û dengû basan bêje??

Me Şehîd Serbazê bê can jî her wisa di nav xwîna wî de cî hêla û çûne pêş. Di kûçe û kolanên gund de mirov dikarî bibîne ku ji şehîd û birîndarên Pêşmerge û xelkê bêberevan bigre heta hesp û heywan, pez û malat û teyr û tewal hemû digel hev di bin topbarana dijminê dilreş yê dagirker de dihate qirkirin.

Bi rastî rojeke tirsnak bû. Beşa herî zaf a Kadr û Pêşmergeyan û fermander di nava gund de bûn û fidakarî dikirin ku birîndaran bo parastin û dermankirinê cîbicî bikin û her wisa jî xelkê bêberevan ê gund rênîşanî dikirin ku çawan xwe û zarokên xwe biparêzin.

Divê bête gotin ku heta niha çendîn şehîd û birîndarên me hene, lê hêj jî Pêşmergeyên di nava gund de bûn, şer nekirine. Dijmin her bi çek û sîlahên qurs cîyê Pêşmergeyan agirbaran dike. Dijmin di bin agirê topbarana xwe de karîbû xwe nêzîkî gundê Ceterê bike û ji sê aliyan ve gund bêxe bin dorpêça xwe. Wextê ku me rewş wisa dît, min gote hevalan ku ewa Pasdar li me nêzîk bûne û baştir e em herne nava wan û em bêjin em hatine teslîm bin! Heta em bikarin ji nêzîk ve bi wan re şer dest pê bikin. Hevalan ew yek pejirand. Me got heta em bi top û katyoşayan bêne kuştin û çi hêzên dijmin jî neyêne kuştin, baştir e em herin şer bikin û bila em di şer de bêne kuştin. Em ew kesane çûn: Hacî Cindî, şehîd Seîd Çiraxî ( Kadrekî Azerîziman ê PDKÎ bû di havîna sala 1364 (1985)di gundê Sinciyê de hate şehîdkirin), Yûsif Keanî (ew jî kadrekî Partiyê bû ku digel du hevalên xwe yên kadr bi navên Mistefa Mînayî û Selam xelkê gundê Axçeqel her bê ser û şûn bûn û heta niha jî dîyar nine çarenivîsa wan çi jê hat), B.A, û renge du yan sê kesên dinê jî hebin. Belê me çekên xwe girtine destê xwe û berev hêzên dijmin çûn. Dema em ji wan nêzîk bûn, ew hatne pêşiya me û gotin: teslîm! Me jî bi dengê bilind got: ewa em tên teslîm bin! Ew gellek kefxweş bûn. Bi rastî ewan çi wexta hizra hindê nedikirin ku Pêşmerge bikaribin îdî şer bikin. Dema ku hatin çekan li me werbigrin, me dane ber gulan û şerekî ten bi ten û bi narincokan dest pê kir. Em ketne nav hev û her deqîqeyekê de çendîn narincok diteqiyan. Ewa yekemîn şer bû ku di nava gund de dest pê dikir. Piştî wê yekê em ew çend kesane ketine bin perê hêzên dijmin û me rêya revê jî li wan girt. Ya rastî em çûn ku xwe fida bikin û bikarin hindek jî hêzên dijmin bikujin û tola wan kuşt û kuştara di nava gund de vekin. Dema ku şerekî wisa dest pê kir, elheq dengê kadr û fermanderên sîyasî û eskerî bilin bû û hawar dikirin:

***"lêdin roj roja mêraniyê ye! Lêdin Pêşmergeyên demokrat û mêraniyê biafirînin wek caran!"***

Ewa bû ku Pêşmergeyên ku di gund de

www.arsivakurd.org

bûn, mîna mêrxas û dil bi kul hatne hawara me. Ew hêzên dijmin ku ji aliyê gundê Mîrava ve hatibûn ku Ceterê dorpêç bikin, wê carê ew bi xwe hatin dorpêçkirin. Bi şahidîya wan Kadr û Pêşmergan heta yek kes bo nimûne jî xilas nebû.

Belê di yekem rûbirûbûnê de dîsan li hember mêrxasî û bîr û bawera Pêşmergan, dijmin serşor û zelûl bû. Ewî şerî bandoreke gellek baş danî ser parêzvanên Kurdistanê ku demeke dirêj di bin top û katyoşabarana dijmin de hevalên wan dihatin şehîd û birîndarkirin, bê wê hindê ku bikarin derbê li dijmin bixin. Her wisa ji bo dijmin jî derket ku bîr û bawera Kadr û Pêşmerge gellek ji wê kûrtir û firehtir e ku bi topbaranê bên û teslîm bin yan jî nekarin şer bikin. Bi her hal ewa destgermîyeke baş bû ji bo hêzên PDKÎ.

Rastî ewa bû ku hêzên Pêşmerge ji hêvî dikin ku hêzên dijmin bên û di nava gund de şer bikin. Lê dijmin zêdetir pişt girêdabû bi topxanê û her çi hêzên xwe dişand nedikarîn xwe demekê ber Pêşmergeyan bigrin û hemû dihatin jinavbirin. Mirov digot ku ewan li hember Pêşmerge çek li dest de nine. Pêşmergeyan dixwast wan kul û kederên topxanê ji difinên hêzên peyaderev derbînin.

Piştî wî şerî, di wî qada şer de ku dikete aliyê Mîrava, her wek hate baskirin, hêzên dijmin hemû hatin kuştin. Îdî pêywendiya dijmin tevî hêzên wan di wî qada şer de qut bibû û nedizanîn ku çi qewimiye û kî hatiye kuştin û kê maye. Ji ber vê çêndê jî heta demekê topbarana wê derê hate sekinandin.

Niha gundê Ceterê di destê me de ye. Yanî dora wê ji du aliyên başûr û rojava ve di destê Pêşmergan de ye û li bakurê gund jî topxane û hêzeke zaf ya dijmin ku li bajarên Urmiyê, Selmas û Kela Xoyê anîbûn, cîgir bibûn. Gund û derdorê wê jî wek neynûkekê ji wan diyar bû. Ji ber wê yekê kesê nedikarî li gund derkeve. Li rojhelatê gund jî hêzên wan hene.

Dema ku dijmin zanî hemû hêz û qaweta wan ji aliyê rojava(aliyê Mîrava) ji dest çûye, carake din ew der dane ber topbaraneke pirr tund. Mirov nedikarî ji ber topbaranê serê xwe derxîne. Dijmin dîsan di bin wê topbaranê de karî hêzên xwe ji qada şer ya rojava bigîjîne nava gund û daxwaza teslîmbûnê li Pêşmergan dikirin. Her ew cîyê ku em ew çend heval lê bûn, me nedikarî ber topbaranê xwe nîşan bidin. Nişkêve çend Pasdar gihîştin ser kozika me û daxwaza teslîmbûnê ji me kirin. Belê ew dîsan şaş li Pêşmergan halî bibûn. Ewan dikarîn wan Pêşmergeyan bikujin, lêbelê teslîm kirin, tu car.

Hêza tazenefes ya dijmin karîn di bin agirê tund ê topxane û çekên qurs de di ser wan hemû cesedên (kelexên) kuştiyên xwe re derbaz bibin û bigîjne ser çeperên Pêşmergeyan. Dîsan mêrxasên Kurdistanê ji kozikên xwe hatin derê û şerekî tund û dest bi pêsîr tevî hêzên tazenefes yên dijmin dest pê kirin. Wê carê jî Pêşmergeyan wek nêçîrvanan serî û binî lê girtin û wek di stran û dastanê Kurdî de dibêjin, ***"ew ma ku li mala xwe nehatibû."*** Pêşmergeyan dîsan ibtikar û kontirola şer girtin destê xwe û moral û ruhiya wan gellek li serê bû û ruhiya dijmin jî berevajî gellek ketibû xwarê.

Hêjayî gotinê ye ku di êrîşa wê carê de mixabin du hevalên hêja hatine şehîdkirin û çend kes jî birîndar bûn. Yek ji wan şehîdan kek **Mehmûd Kirêve** bû ku wextê di nava gund de derket û êrîş kire ser kozikên dijmin û bi narincokan li wan dixist, kete ber guleyan û şehîd bû. Navhatî berpirsê wê desta Pêşmergên hêza şehîd Aware bû ku bo karên hizbî hatibûne devera Şimala Kurdistanê. Şehîdê dinê jî **Seîd Mendan**(Xince) li hêza şehîd Niho bû. Şehîd Seîd Xince lawekî qehreman û fidakar bû.

**Dûmahîk Heye...**

## Doma rûpela 3

Ev biryar rê dide xelkê Îrlanda Bakûr ku hevdem xwediyê 2 nasnameyên neteweyî bin û dema bixwazin, dikarin bibin xwediyê heman maf û îmkanan ku xelkê her du welatên Îrland û Birîtaniya hene.

Lê civaka Îrlanda Bakûr hêj du perçe ye. Niha jî Katolîk û Protestan li ser du rêbazên cuda yên siyasî dimeşin. Hîç yek ji wan civakan hêviyên hevgirtina bi Îrland (Katolîk) an mana bi Birîtaniya (Protestan) re neavêtine. Lê her du alî jî hatine ser wê baweriyê ku îmkan heye li gor rewşa ku tê de, riya sêyemîn bibînin û bikaribin bi hev re bijîn. Mafên taybet yên ku her du hukûmetên Dublin û London ji rûniştvanên wê beşa giravê re pejirandindiye, hêviya jiyanek bi hev re xurt dike.

Pirsgirêk ev e ka gelo kes yan aliyên li pişt bûyerên vê heftiyê rawestiyayî, dê pêvajoyek nû ya tundûtûjiyê dest pê bikin anî ne. Eger bê û rewş bikeve qonaxek weha de, wê demê civaka Katolîk ya Îrland ku bi hêviya hevgirtina bi Îrlandê re ye, wê di nava xwe de jî tûşî aloziyan be, ji ber ku piraniya xelkê heremê ji alozî û tundûtûjiyê bêzar in. Derfetên demokratîk yên di destê xelkê welat de jî îmkana bidestxistina destkevtên zêde li riya lihevhatinê re xurt dike û tu meşrûiyetê nade şer û tundûtûjiyê.

## Şiroveya Peyvên Siyasî



**Berhevkar:**
**Omîd Esxeran**
**omid_anbi@yahoo.com**

# Dîplomasî

Dîplomasî ji peyva "Diploma" bi wateya belge û bawername hatiye wergirtin û ji hunerekê re tê gotin ku bi mifahwergirtin ji bingehên wê, em dikarin tevî kesayetiyên dewletan gotûbêjan bikin. Dîplomasî hunerek e ku mirov dikare ji rêya wê ve bi ser asteng û girêpêçkan de zal be û bi awayekî jêhatî û bê şer û pevçûn pirsgirêkan çareser bike û wan bigihijîne encamê. Dîplomat kesek e ku bi mifahwergirtin ji dîplomasiyê dikare pêwendiyên dîplomatîk di nava dewleta xwe û dewleteke din de ava bike û ji rêya gotûbêjan ve delîveyek baş ji bo pêkhatin û lihevhatinan xweş bike.

Têgiha dîplomasiyê di dawiya sedsala 18'an de di hemû zimanên navneteweyî de, berfireh bû. Hêjayî gotinê ye ku hêdî hêdî guhartin bi ser naveroka dîplomasiyê de hat û girîngî ji pile û payeya dîplomatan di cîhanê de hate dayîn. Dewletên cîhanê hewl didan ku kesên kêrhat, lêzan, zîrek, çalak, biwêr û xwedîkarîn ji bo kar û barên dîplomatîk û erkên dîplomasiyê hilbijêrin. Hunera dîplomasiyê li ser bingeha baweriyê hatiye avakirin û dîplomateke/î kêrhatî, divêt hewlê bide ku di gotûbêjên xwe de bi dilpaqijiyê ve baweriya kesê hemberî xwe bidestve bîne. Girîngiya dûplomasiyê roj li pey rojê zêdetir dibe, çunku piraniya xelkê li ser vê baweriyê ne ku mirov nikare ji rêya şer û pevçûnana ve bigihîje armancên xwe, çunku şer ji bilî kavilkirin û malwêraniyê tu encameke din tune û arîşe û ji hev tênegihîştin ji rêya gotûbêjan ve baştir çareser dibin. Hin caran jî ji ber girîngiya dîplomasiyê, serokê dewletan û wezîrên welatan, dewsa dîplomatan beşdariyê di gotûbêjan de dikin û hemû karên girîng birêve dibin. Wezîrê/a derveyê/ya her welatekê weke serokê/a dîplomasiya wî welatê tê hesibandin.

Her wiha dîplomat û siyasetvan jî ji wî/ê kesî re tê gotin ku bi kar û barên siyasî ve mijûl e. Karmendên payebilind ên Wezareta Derve û kesên fermaber ku di welatên din de tenê ji bo kar û barên siyasî ên dewleteké ve mijûl in, weke dîplomat tên hesibandin. Hin caran jî bikaranîna peyva dîplomat ji çarçoveya rasteqîn a xwe derdikeve û ji kesên şareza, hişmend û sopermen re tê gotin ku bi liv û lebateke şarezayane tevî xelkê din têkilî û gotûbêjan dikin.

**Çavkanî: (Ferhengî Ramiyarî Nîga) Azad Weledbegî**

**(Danêşnamêyê Siyasî) "Politicial Dictionary" Daryûş Aşorî**

www.arsivakurd.org

# 8'ê Adarê, Roja Vejiyan û Berxwedanê


**Arif Nadirî**



152 salan berî niha, yanî di roja 8'ê Adara sala 1857'an de, jinên kedkar ên farbrîkeya ristin û raçandina bajarê "New York"ê li Amerîkayê, li dijî çewisandina wan ji aliyê xwedî karên xwe, xwenîşandaneke girse û berfireh meşandin. Piştî wê salê, di 8'ê Adara 1908'an de, piştî derbazbûna 50 salan, karkerên jinên karxaneya ristin û raçandina Ketanê li "New York"ê dest dane girevgirtinê. Bi sedema agirberbûnê, 129 girevgirtî ku ji aliyê xwedî karên xwe ve hatibûna girtin, canê xwe bext kirin. Ev bûyer bûye hevên û bingehek ji bo bixwedehatin û bi xwedeçûna jinan di cihên cuda yên cîhanê de, heta vê çendê ku bi sedema zindîragirtina bîranîna 8'ê Adarê li "New York"ê û her wiha rêzdanan ji bo serhildana jinên kedkar di welatên din ên cîhanê de, di sala 1913'an de, ev roje di asta cîhanê de weke Roja Cîhanî a Jinê hate binavkirin, Neteweyên Yekbûyî jî di sala 1975'an de, 8'ê Adarê weke Roja Cîhanî ya Jinê bi awayekî fermî pejirandin.

Beşek ji jinên cîhanê di heyamê 152 sal xebata bêrawestan û berdewam de, bilî ji holê rakirina gellek ramanên şaş û nerast derheqî jinan û hevterîbkirina xwe tevî mêran û na gotin bi ferq û cudahîdanana zayendî, îro desthilatdariya hinek dewlet û dezgeh û navendên sereke ên biryardana cîhanê di dest û stûyê wan de ye.

Pêvajoyek dîrokî ku du pêlên femînîzmê (femînîzma Lîberal û Radîkal) derbaz kiriye û niha pêla sêyem a femînîzmê bi armanceke mirovperwerî û wekhevîxwaziyê ne regezî di holê de ye. jin bi giştî û benemaze Jinên Kurd jî di vê navberê de xwediyê dîrok û serpêhatiya taybet bi xwe ne. Yekemîn rêxistina taybet bi jinên Kurd di sala 1919'an de, li Stenbolê ji aliyê Amine, hevswera Şerîf Paşa hatiye avakirin. Piştî wê di sala 1946'an de, di serdemê Komara Kurdistanê de, Yekî tiya Jinên Demokrat ên kurdistanê hate damezrandin. Ji aliyekî din ve, piştî hatne serkara rejîma Îslamî di Îranê de, xebat û berxwedana jinên kurd li dijî wê rejîma teokrasiyê û hewildana ji bo çespandina mafên xwe, bi xwe nîşandana jinên kurd di 8'ê Adara 1979'an, li bajarê Sine dest pê kir. Pêvajoyek ku heta jin neçar bûn bona bidestveanîna mafên xwe ên mirovî û neteweyî, xebata çekdarane jî bigrin pêşberî xwe. Heke çi heta 20 salan piştî 8'ê Adara 1979'an, jinên kurd li Rojhilatê Kurdistanê nekarîn roja jinê pîroz bikin, lê di vê yek dehsala dawiyê de, bê çavnihêrbûna molet û derfetdana dewletê, çi bi fermî û çi bi ne fermî ew roje di Kurdistanê de bi awayekî bê mînak pîroz kirine û pirr caran nirxa wan kiryar û tilismşikandinên xwe jî dane. Ji ber ku di Komara Îslamî de, ji aliyekê



rêzgirtin û pîrozkirina 8'ê Adarê qedexe ye, ji aliyê din ve, wan roja ji dayîkbûna Fatme jina Îmam Elî weke Roja Jinê destnîşan kiriye. Lewra jinên kurd ji rêya pîrozkirina 8'ê Adarê û rojevkirina daxwaziyên berheq û mirovî ên xwe, ji bilî xebata bona wekhevî û civakek yeksan û adilane, hevdem jî berengariya siyasetên rejîmê ji bo tevlihevkirina têgih û hinceta dikin, rejîmek ku di heyamê van sê dehsalên borî de xwastiye bi binavkirina rojekê bi navê jinê û anîne rojeva têgiha Femînîzma Îslamî û mafê mirovan yê Îslamî, hemû rastiyan aloz û tevlihev bike.

# Bi Hinceta 8'ê Adarê, Roja Cîhanî A Jinan, Semînarek Ji Aliyê YJDKÎ Ve Birêve Çû

Bi armanca rêzgirtin ji 8'ê Adarê, Roja Cîhanî a Jinan, Komîteya Birêveberiya Giştî a Yekîtiya Jinên Demokrat ên Kurdistana Îranê, demjimêr 15'ê piştînîvroya roja yekşem, 07.03.2009'an, semînarek bi beşdariya 4 çalakên siyasî û mafê jinan, lidar xist.

4 beşdarên semînarê li ser 4 aliyan pirs û mijarên têkildar bi xebat û tekoşîna mafxwazane a jinan xistin berbas û bala beşdarên semînarê bo aliyê axavtinên xwe rakişandin, ev in:

Hêro Celdiyanî, Berpirsa giştî ya Yekîtiya Jinên Demokrat ên Kurdistana Îranê, mijarek bi navê "Lênihêrînek bi ser xebat û çalakiyên jinên Îran û Kurdistanê di sala borî de" pêşkêş kir.

İrfan Rehnimûn, endamê Komîteya Navendî a PDKÎ, mijara "Bandorên erênî yên beşdariya jinan di warê siyasî de" pêşkêş kir.

Narîn Mihemedî, bi mijara "Arîşe û astengên hember kar û çalakiyên jinan" tevlî semînarê bû.

Şaho Ferazmend, endamê Komîteya Navendî a PDKÎ, babeta "Rola mêran di pêşdebirina xebata wekhevîxwaziya jinan de" pêşkêş kir.

Her çar beşdarên semînarê, derheq mijaran bi hûrî axivîn û aliyên cur bi cur yên wan mijaran derheq maf û azadiyên jinan şirove kirin.

Piştî pêşkêşkirina mijarên han, ji aliyê Çinûr Qadirî ve ku rêvebera semînara bû, rê bi beşdarên semînarê jî hate vekirin û radeyekî zaf ji mêr û jinên beşdarî semînarê, têdîtin û nêrînên xwe derheq mijarên pêşkêşkirî, anîn ziman û diyalogeke gellek germ û gurr di navbera pêkînerên semînarê û beşdaran de çê bû



ku xaleke balkêş ya semînara han bû.

Di dawiyê de ji aliyê her yek ji rêzdaran, Hêro Celdiyanî, Irfan Rehnimûn, Şaho Ferazmend û Narîn Mihemedî ve bersiva pirsan hate dayîn û li gor pêdiviyê, derheq têdîtinên beşdaran axivîn.

Hêjayî gotinê ye ku semînara han piştî 3 demjimêran bi dawî hat.

www.arsivakurdi.org

# Rewşa Mihemedsidîq Kebûdvend Cihê Nigeraniyê Ye

Sekretariyeta Rêxistina Parastina Mafê Mirovan li Kurdistanê(RMMK) derbarê rewşa Mihemedsidîq Kebûdvend di bîst û yekemîn meha zîndanîbûna wî de, raporek nû weşand û diyar kir, rewşa Kebûdvend her weke berê cihê nigeraniyê ye û tendurustiya wî di xeterê de ye.

Mihemedsidîq Kebûdvend ku niha di girtîgeha Êvîn a Tehranê de ye, rewşeke pirr xirab û cihê nigeraniyê heye. Êş û janên dil ji wî re gellek pirsgirêk pêk anîne. Heta niha du caran dilê wî sekiniye, her wiha bi sedema êş û azara gurçîlkan ve, tendurustiya Kebûdvend ketiye xeterê.

Di du mehên borî de, ji ber rewşa wî a xirab di warê tendurustiyê de, parêzerên wî daxwaz ji Dozgerî û Wezareta Ewlekariyê kirine ku bi awayekî demkî bê berdan, lê wan daxwaziya parêzerên Kebûdvend cîbicî nekiriye.

Her çiqas berdevkê dezgeha Dadweriyê rewşa Mihemedsidîq Kebûdvend normal daye zanîn, lê berpirsiyarên dermanî diyar kirine ku navhatî hewcehî bi operasyona Anjografiya dil û razandin di nexweşxaneyê heye û piştî derbazbûna 40 rojan ji vê gotina berpirsên dermanî, hêşta pêregihîştina dermanî ji bo Kebûdvend nehatiye meşandin.

Rêxistina Parastina Mafê Mirovan li Kurdistanê, serbarê dana hişyariya micid derheq rewşa bi xeter a tendurustî û nemaze jî nexweşiya dil a Mihemedsidîq Kebûdvend, berpirsiyariya her cure bûyereke qerebûnekirî di vê derbarê de dixe stûyê Cîgirê Ewlekarî yê Dozgeriya Şoreşa Tehranê û Wezareta Ewlekariya Komara Îslamî.




Wê rêxistina parêzer a mafê mirovan, serbarê bibîranîna dubare ya xemsariyê derbarê rewşa cendekî a girtiyên siyasî di girtîgehên Komara Îslamî a Îranê di van salên dawiyê de û bi îsrarbûna berpirsiyarên dadwerî û ewlekariyê bona domkirina girtina van cure girtiyane, daxwaz ji berpirsên payebilind ên Komara Îslamî kir ku li gor qanûn û berpirsiyariya exlaqî li hember parastina canê girtiyên siyasî pêbend bin û tevbigere.

## Roja Cîhanî A Jinan Li Bajarê Sine Hate Pîrozkirin

Roja înê, 06.03.2009'an, bi hinceta 8'ê Adarê, Roja Cîhanî a Jinan, rê û resmek li çiyayê Aviyer li bajarê Sine de birêve çû.

Roja înê, li gor biryara berê, gellek ji çalakên sivîl, bi taybet jin, ji demjimêr 8'ê sibê ve li hinek meydanên bajarê Sine civiyan û piştre bi awayê çendîn girûpan ber bi çiyayê Aviyer ketin rê.

Di rê û resma han de serbarê bilindnirxandina Roja Cîhanî a Jinan, çendîn gotar, helbest û sirûd ji aliyê



beşdaran ve hatin pêşkêşkirin.

## Şehîn Mihemedî, Çalaka Kurd Ya Mafê Jinan Ji Bo Îdareya Ewlekarî A Merîwanê Hate Gazîkirin

Navenda Nûçeyan a PDKÎ eşere kir ku bi nêzîkbûna 8'ê Adarê, Roja Cîhanî a Jinan û di heyamê girevgirtina xelkê bajarê Merîwanê de, Şehîn Mihemedî, berpirsa Encumena Jinên Merîwanê, bo Îdareya Ewlekarî a wî bajarî hate gazîkirin.

Hevdem tevî girevgirtina giştî a xelkê bajarê Merîwanê, hêz û aliyên Ewlekarî ên wî bajarî dest bi girtin û gazîkirina çalakên warên cur bi cur kirin.

Di vê derheqê de yek ji wan kesên ku ji aliyê Îdareya Ewlekarî a Merîwanê ve hatiye gazîkirin, Şehîn Mihemedî, çalaka warê jinan û berpirsa Encumena Jinên Merîwanê ye.

Li gor agahdariyên ku ji aliyê



malbata Şehînê ve gihîştine destê me, gazîkirina han bi rêya telefonê ve bûye.

Di pêwendiya han a telefonî de berpirsên Îdareya Ewlekariyê ragihandine ku Şehîn Mihemedî divêt di dema herî zû de bihê ji bo Îdareya Ewlekariyê.

Gazîkirina berpirsa Civata Jinên Merîwanê ji bo Îdareya Ewlekariyê, yê bûye cihê nigeraniya malbata wê jina çalak a Kurd û çalakên din yên bajarê Merîwanê.

## 6 Kes Di Çend Parêzgehên Îranê De Hatin Îdamkirin

Li gor nûçeya malpera "iranpressnews"ê, di çend rojên borî de, berpirsên rejîma Komara Îslamî a Îranê biryara daliqandina 6 kesan di çend parêzgehên welat de birêve birin.

Dezgeha Dadwerî a rejîma Îranê roja duşem, 09.03.2009'an, 4 kes ji hevwelatiyên Belûçî ên Sunî, bi buxtana "Muharibe"(Şer tevî Xwedê), di girtîgeha Zahidanê de îdam kir.

Her wiha Rêxistina Mafê Mirovan li



Îranê ragihand Hamid Mihemedzade, xelkê bajarê Miyanduavê, bi buxtana kuştina enqest, roja 02.02.2009'an, di zîndana bajarê Urmiyê de hate daliqandin.

Her wiha girtiyek din bi navê Mistefa.M temen 34 salî û xelkê yek ji gundên Îsfehanê hate daliqandin.

Divêt were gotin ku di heyamê 10 rojên borî de, pitir ji 20 kes li bajarên cur bi cur yên Îranê hatine daliqandin û 35 kesên din bi cezayê Îdamê hatine mehkûmkirin û li bend daliqandê ne.

www.arsivakurd.org

# MUZÎK



ADAR JIYAN
adarjiyan@mynet.com

Muzîk, şaxa hunera herî razber e. Hunera wêneya ku ji şewqdana xwezayê bidûr dikeve, ji teşegirtina muzîka ku xwerû ji hêmanên wêneyan û dûrî heyberiyê gellek tiştan hîn dibe. Bi vî awayî wênesaz, berê xwe ji xwezayê diguhere û li hêmanên wêneyê dizivire.

Sirf ji bo hunera reng û teşeyê vê yekê têr dibîne û qîma xwe bi vê yekê tîne. Piştî ku hunera wêneyê û wênesaziyê ji kevneşopiya şewqdander rizgar dibe, dema hunera razber dest pê dike.

Nêrîn û nêzîkdayînên hunermendan, ên derbarê mûzîkê de cihê û guherde ne. Hin jî muzîkê ji bo xwe wekî jêderka bestê (îlhamê) dibînin; hin jî rasterast wêneyên muzîkê çê dikin; hin jê senfonî fug û hwd. Ango formên muzîkê vediguhezînin wêneyê û hin jî ji teşegirtina hêmanên muzîkê de sûdê werdigirin.

Di hunera wênesaziyê de, hunermendên ku ji muzîkê bandor girtine gellek in. Hin jê ev in: Mandrian, Matisse, Pallock, Kandnsky, Delaunay, Klee û hwd.

Wekî din jî di warê tibê (bijîşkî) de deng, tîp û jimare di têgihîştinê de bi awayekî awarte bandorê li ser mirovan dike.

Li gora hin agahiyên ku hatine bidestxistin, tê gotin ku kesên nexweş, di xerabebûna têgihîştina bi navê "Sînestezî" de deng û awazan dibînin, rengan dihishisînin û çêjê ji lewnan (şiklan) distînin. Bêguman pêwendiya navbera nifşên hunerê mijareke gellekî kûr û bergehdar e. Wekî mînak: Têkilî û hevhîkariya navbera wêne û muzîkê, muzîk û hunerê, huner û wêjeyê car caran hatiye vekolandin û di vî warî de derencamên balkêş derketine holê. Heta destpêka sedsala bîstemîn jî, têkiliya navbera nifşên hunerê di asteke sînordar de dimîne.

Belê di dawiya sedsala nozdemîn de, bi pêşveçûn û rûdanên zanistî û teknîkî re sînorên navbera cureyên hunerê hemû dirûxin û hevhîkariya navbera şaxên hunerê dest pê dike. Çendî ku îro ev rastî derketiye holê û hevbandoriya navbera nifşên hunerê diyar be jî, bi giranî hevbandoriya muzîk û wêneyê berçavtir e. Lewra fotograf û sînema beriya niha bi salan, ji wênêsazên ku xweza ji xwe re kirine mijara hunerê, sûd wergirtine. Peyre wênesaz, arasteyî dahûrandina hunera muzîka xasedariya razber dibin û di navbera muzîk û wêneyê de têkiliyeke xurt, belê veşarî dibînin. Li gorî zanistiya hunerê û nêzîktêdayinên wê, tê gotin ku bi bandora têgihîştineke cuda, hin wênesaz dikarin muzîkê li dîtbariyê dagerînin.

Dîsa angaştên ku deng û awazan direjî qada libat û dîtbariyê dikin, hene.

Tê gotin ku tîpa 'r' yê, libatî û herikbariyê; tîpa ' î ' yê jî ronîdarî û mebehiyê (zelaliyê) hêma dike.

Her wiha Gombrich, girêdaniya navbera dîtbariyê û zimên bi vî awayê tîne zimên: " Li gora baweriya min em hemû dengên zimên bi riya têgihîştina dîtbariyê dihishisînin." Hempêhesî (synesthesia), ango pênc lebatên me yên sehekî jî vê yekê diselimînin ku vatiniya sehekiyekê derbasî ya din dibe, an jî sehekiyeke me bandorê li ya din dike. Bo nimûne, lawjeyên gellek zimanan jî, dîtina dengdêriyê û bihîstina rengîniyê diçesipîne. Ramana ku neherike nava razberiyê an jî ji jiyanê neqete, pêkane ku ji aliyê têgihanên sehekiyê de bê perwerdekirin.

Jixwe perwerdekirina têgihanên sehekiyê, perwerdekirina hunerê ye.

Xaseyên hunera muzîkê ya razber, bandorê li ser hunera wêneyê ya ku di têgihanên sehekiyên mirov de xwediyê roleke girîng e, dike.

Ev berpêbûyîn, ji aliyê girêdaniya mijara perwerdehiya hunerê ve gellekî girîng e û hunermend eleqedar dike.

Lewre di perwerdehiya hunerê wêneyê de, ji bo motîvasyon û zêdekeriya serkevtinê, guhdarîkirina parçeyekî muzîkê wekî pêkerekê tê dîtin. Divê ku di perwerdehiya hunera wêneyê de pirî caran ev sepan pêk were. Belê li vir tiştê ku tê pêşniyazkirin, dîdina hîkariya dîtbariya muzîkê ye.

Ji mirovên seretayî û hoveber bigirin heta mirovên îroyîn, yên teknolojiya dîtbar; di her demê de mirovan bi navgîniya dîmenan hest û ramanên xwe derbirrîne.

Mirovan car caran bi mebesta ku dikaribin debara xwe bikin û jiyana xwe bidomînin û car caran jî bi mebesta ku berhemên hunerî biafirînin ev yek pêk anîne.

Belê rastiyeke wisa jî heye. Çendî ku her gav ne bi mebesta hunerê be jî, mirovan gellek caran ji bo ku pêdiviyên xwe pêk bînin, di kar û xebatên xwe yên rojane de, li gewzîn û xweşikiyê geriyane.

Ji karê necariyê bigirin heta hesinkariyê, ji ferfûrvaniyê bigirin heta zêringeriyê; di her karî de dîmeneke wêneyî an jî dengekî muzîkî xwe nîşan dide.

Di vir de jî mirov dikare pêwendiya muzîk û wêneyê li nik hev û car caran di zik hev de bibîne. Lewre, dengê çekûçê hesinker ahengeke muzîkî; zerifandin û qewartinên ser derî û derabeyên hesinî jî xuyangeke wêneyî ye.

Wekî mînak: Li gora gotegotekê, Mewlana Celaleddînê Romî, wekî muzîkê li dengê çekûçê dost û hemdemê xwe Selaheddîn Zêrkûb(zêrger) guhdarî kiriye û bi saetan li ber ahenga vê muzîkê sema girtiye û pê re reqisiye.


Gava ku Zêrkub jî vê dîmenê dibîne, li gora wê çekûçê xwe hiltîne û datîne û bi reqsa Mewlana re dikeve nava ahengeke kûr û manîdar.

Bi kurtayî gellek tiştên ku peywendî û lihevkirina navbera dîmen û muzîkê diselmîne hene.

Kaniya Helbestan

# ADAR

## Bêrî buhar



Adar heyva te ye,
îro roja te ye,
Dizanim ne îro û ne jî tu rojan nayê ji te re,
Kulîlkek, an jî nameyeke bi merheba.
Navê te gotarên serê rojnameyan be jî,
Tu yê tim li serê riya bî,
Li nava laşfiroşan û di destê mirovên hindirqewartî.û li rêya birçîtiyê,
Di çavên te de sîtem û valahiya temenekî,
Tu yê tim di hawar û qîrîniyan de bî.
Bîbûkên te pirtûkek zelal in,
Têde tê xwendin zordestî ya nizanim çend temenan.
Ew çax heman kes dikare para xwhilbijêre
Para xwe yî rûreşiyê.
Arên ku berdane canê te,
Te kirin sotik û teraf,
Bi hêza te xwe ji bahozan parastin.
Bêxwestin û biryara te,
Tecawûzî jiyan û bîranîyên te yî pîrozkirin.
Li zîndanan te can da canên din û navê wan te danî "zîndan"
Bê lome be nê sere guran!
Di nava gemara dîrokê de tu ne tiştekî
Lê birînên kevin didin zanîn ku çawa ji bo te dimeşe jîn.
Di Kîjan ferhengê de bi hevre ne,
Birçî bûn û birûmetî,
Li ser bajaran weke cilekî reşe birçîtiya te,
Di bihiştan de veşartiye û negihan e rûmetiya te.
Hêsîrî û belengazî te kir bûxçik û da ser milên xwe,
Tu bûyî dayika kul û êşan,
Jina nizanim Kîjan malxerabî,
Xûşka Kîjan cambazî,
Keça Kîjan bêfam û zordarî.
Li van bajarên bêîman bi birînên xwe ve dinalî.
Baranê biriye rengê porê te,
Her ku di bîra xwe tînî ew deşt û zozanên xwe,
Ew gelî û çiyayên xwe.
û ji xwe dipirsî
Gelo heye ku li min vegere jiyaneke wekhevî,
xwezayî û bi mirovatî?
îro roja te ye,
Navê te di sere heman nûçeyan de be jî,
Tu yê dîsa li riya birçîtiyê bî,
Dîsa di hawar û qîrîniyan de,
Heya ku xweza, rojekê vegere ser lîsê xwe.
Te hemêz dikim bi tevî êş û kulên te,
Diramûsim cihên pirr êşiyayî,
Diramûsim çavên te,
Ez bawerim bi te,
Ew destên ku dergûş dihejîne
Dê rojekê dunyayê bihejîne...

www.arsivakurd.org

# Lehengek Ji Lehengên Welatê Min Dr. Vet. M. Nûrî Dersimî (1892 – 1973)




**Konê Reş-Qamişlo**

Pêwîst e ku mirov di govenda mêran de dîlanê bigerîne, li gor bejin û bala wan, bejin û bala xwe bihejîne, û pîş û sazên wan ji gelê xwe re derînê.. Erê, êş û azarên wan şanî gelê xwe bide, berxwedan û pêdariya wan, mêranî, dilsozî û wefadariya wan ji xwendevanên zimanê xwe re raxîne..

Di rojên 10-11-12.02.2009'an de, bi serdaneke taybet çûme bajarê Helebê, Efrînê û Çiyayê Kurmênc bi tevayî(Deşta Cûmê, Şikakan, Ciyayê Lêlûnê û Navçeya Şêrewiyê), da ku pêzanînan li dor kurdên resen (Êzidîyan) kom bikim. Di vê geşt û gerrê de, min gellek kesan dîtin, bi gellek kesan re axifîm û min pirsa gellek kesan û tiştan ji wan kir. Di nav re jî, min pirsa hin navdarên kurdan mîna Dr. Nûrî Dersimî kir.. Ewên ku xebat û bizav di ber kêşeya gelê me de kirine û malê xwe û canê xwe di rêya welatê birîndar de winda kirine..

Wiha ez li Dr. Vet. M. Nûrî Dersimî sekinîm û serboriya wî gelekî bala min kişand.

Dr. Nûrî Dersimî; yê ku yekî bingehîn bû ji lehengên serhildana Dersimê a 1937'an. Piştî têkçûna serhildanê di dawiya sala1937'an de û bidarvekirina bihiştî Seyîd Riza (serokê serhildanê) û her deh hevalên wî, Dr. Nûrî Dersimî ji neçarî û bi halekî xerab xwe gihand Sûriyê, bajarê Helebê. Û wiha her 35 salên xwe yên dawî li Helebê, di nav kurdên çiyayê Kurmênc de derbas kirin.

Belê tevî xwînherikandina wek cobaran di serhildana Dersim de, ew ji desthilanîn neket û xwe ji ber neyartiya Tirko neda alî.. Tirko yê ku heval, dost û xizmên wî kuştin, sirgûn kirin û di zîvariyan de belav kirin.. Û her wiha li Sûriyê jî wek lebatekî aktîv ket nav refên welatparêzên Kurdan de, li kêleka Bedirxaniyan û hevalên wan sekinî û bi wan re kar û xebat di ber kurdewariyê de kir… Di sala 1952'an de pirtûka xwe a navdar bi navê: (KURDISTAN TARIHINDE DERSIM), li Helebê çap kir, lê mixabin ku ji rex rijîmê ve hat qedexekirin.. Belê, ta di mirinê de jî, Dr. Nûrî Dersimî nexwest neyar zanibe ku têkçûye û razî nebû ku serê wî li ser ti axê bê danîn ji bilî axa çiyayê Dersimê pêve û Her dem û gav bi axîn û hesreta axa çiyayê Dersimê bû..

Ji min re gotin; Berî ku Dr. Nûrî Dersemî here ber dilovaniya Xwedê, wî di sala 1964'an de, ew mizgeftika biçûk ku wek xanîkî bû di goristana şêx Henan de, li




Kefercenê, ser riya Efrînê, ji nû ve nûjen kir(restore kir), hem jî hewşek ji wê mizgeftê re ava kir û di hundirê hewşê de, gora xwe û ya kebaniya xwe Ferîde xanim kola û amade kir û ev nivîs li ser kêla gora xwe nivîsand:

Dilbirînê Bi Nalîna Welat
Mihemed Nûrî Kurê Mella Îbrahîm Colik Oglo
Li ser vê riya dijwar
Min jî kire pir hawar
Da ji bo we rojekê Dinya bibe gulbihar

Her wiha qewîtiyên xwe (wesyet), li dost û hevalên xwe yên nêzik wek: Dr. Mihemed Cafer, Şêx Mihemed Şêx Îsmaîlzade û hin yên din kirin, ku roja bimire qewîtiyên wî bi cî bînin; yek ji wan qewîtiyan, ku wî li çiyayê Kurdaxê, di goristana şêx Henan de veşêrin, da ku her sibeh bayê çiyayê Dersimê bi ser de bibare. A din ku darbesta wî di ber kunsilxaneya tirkan re derbas kin.. û ya din ku, ew kîsê AXA çiyayê Dersimê, yê ku her dem di bin palgeha wî de bû, di gorê de jî, têxin bin serê wî de.. Belê, û ji min re gotin; dema ku Rehmetî Dr.

Nûrî Dersimî di sala 1973'an de koça dawî kir, me ew qewîtiyên wî, wek ku wî dixwest, bi cî anîn. Lê mixabin gelek kes bi me re beşdar nebûn, newêrîbûn, ditirsiyan..


Di vê gera xwe a çiyayê kurmênc de, min du rojan ser hev gora wî û kebaniya wî ziyaret kir û her car min çend kulîlkên Nêrgizan datanîn ser gora wan. Li ser gora wî wiha hatiye nivîsandin:

Dilbirînê Bi Nalîna Welat
Mihemed Nûrî Kurê Mella Îbrahîm Colik Oglo
Li ser vê riya dijwar
Min jî kire pir hawar
Da ji bo we rojekê
Dinya bibe gulbihar
Li Kurdistana Tirkiyê meha azara 1892'an çêbûye.
Li Helebê di roja 22ê meha abê 1973'an de miriye.

Li ser gora kebaniya wî Ferîde xanim a ku di rex gora wî de ye, bi tenê ev nivîs hatiye nivîsandin:

Dilgirtî
Ferîde Dersimî Elî(Xiz)Oglî

Sê zarok ji wan mane, du keç û kurek, keçek li Almaniya ye, yek li Dûbey ye û kur li Bolgaristanê dimîne. Yezdanê gewre Dr. Nûrî Dersimî û tev têkoşerên Kurdan bi dilovaniya xwe şad bike.



# Yekemîn Festîvala Helbesta Berxwedaniyê Birêve Çû




Roja 04.03.2009'an, yekemîn festîvala Helbesta Berxwedaniyê, ji aliyê Taya 24 a Sefîn ser bi Partiya Demokrat a Kurdistanê û Yekîtiya Rewşenbîrên Neteweyî ên Kurdan, di bajaroka Şeqlava de li Başûrê Kurdistanê birêve çû.

Di vê festîvalê de 12 helbestvan li her çar perçeyên Kurdistanê beşdar bûn û helbest xwendin. Festîvala han bi armanca rêzgirtin û bîranîna serhildana girse a sala 1991'an a Zayînî di Başûrê Kurdistanê de û zindîkirina ruha neteweyî di warê çand û bi taybet tekstên helbestan de birêve çû.

Hêjayî gotinê ye ku 4 helbestvanên Rojhilatê Kurdistanê bi navên Nahîd Husênî, Şerîf Felah, Efrasiyab Giramî û Arif Nadirî di vê festîvalê de beşdar bûn û helbestên xwe pêşkêş kirin.

# MÎRZA HESENÊ SEYFULQUZAT (1876-1945)



**A. BALÎ**

Mîrza Hesen Seyfulquzat, li Rojhilatê Kurdistanê di sala 1876'an de li Sablaxê (Mahabadê) ji dayîka xwe bûye. Wî di destpêkê de li cem bavê xwe dersa olî dest pê kriye, piştre li cem alimên Îslamî di cihên cur bi cur yên Kurdistana Îranê de xwendina xwe domandiye û ya melayetî qedandiye. Ew di malbatek oldar û welatparêz de çavê xwe vedike. Bira û pismamê wî li Sablaxê, Qaziyê Şeriê bûne û hukma dadwerî ji wan werdigre, li Sablaxê bar dike û li gundê Giwêgcelî ku li ser çemê Cexetû hilketiye, ciwar dibe û ligel rêvebirina karê qezawetê bi cotkarî û çandê re mijûl dibe. Bi sazkirina bax û baxçan, wî gundî dike nimûneyek hêja li avedaniyê. Di ciwaniya xwe de dest bi nivîsandinê kiriye. Helbestên xwe li wê navçeyê zû belav bûne. Wî li devera Mukriyan bi helbestên xwe yên welathêz û neteweperwer di nav helbestvanên netewî yên xort de dengê xwe bilind kiriye. Bi ew teybetmendiya xwe di nav helbestvanên di navçeya Mukriyan de bûye helbestvanekî herî mezin. Ji bo vê jî, li devera Mukriyan, ew mamosteyê helbestvanan tête nasîn. Seyfulquzat avakarê (mi'marê) êkolek nû ye di helbesta Kurdî de.

Taybetmendiya helbestên wî ew e, ku cara yekemîn di helbesta Kurdiya Navîn(Soranî) de, wî hewl daye bi zimanek sade ku hemû gelê Kurd jê fehm bike û wî helbestên xwe wusa jî nivîsîne. Di zanîn û nivîsandina xwe de, wî qasî ji destê xwe derketiye peyvên Kurdî bi kar anîne. Li ciyê gotinên Farisî, Erebî û Tirkî, gotinên Kurdî jêçetirgirtin (tercih) kirine û ewna bi kar anîne. Bi ew teybedmendiya xwe, ew di nav helbestvanên wê demê û yên heya îro xwedanê çandek û wêjeyek neteweperwer de ye.

Ew di sala 1925'an de, qasî du salan serokê mudîriyeta Sablaxê (Mahabad) ya perwerdê bûye. Di wê demê de ji bo pêşdebirina sîstema perwedeyek nû û pêşketî pirr ked daye.

Helbestek ku bi henceta "zistana tuf û sar ya sala 1312'ê Rojî (1933'ê Zayînî)" ku mîna nameyek ji bo dost û biraderê xwe "Eziz Axa Ebbasî" re nivîsandiye, ew helbest ciyekî taybetî di helbesta Kurdî de digire. Di helbestê de tabloyek hemû alî li jiyana gundiyên Kurdistanê û her wusa zulm û zordestî li ser Kurdan hatiye teswîrkirin. Helbestên Kurdî yên Seyfulquzat cara yekem di çapemeniya "Komeley Jiyanî Kurd" û çapemeniya serdema Komara Kurdistanê de hatine weşandin.

Lê mixabin ew zilm û zordariya li ser çanda Kurdî ya li Rojhilata Kurdistanê heyî, ji perçeyên din yên Kurdistanê ne kêmtir e. Ji bo vê jî, heya salên dawî, helbestên wî bi awayekî berfireh li hemû Kurdistanê nehatiye naskirin. Di sala 1973'an de Hesenê Qazî, neviyê Mîrza Hesenê Seyfulquzat namîlkeyek piçûk ya helbestên wî li derveyî welat weşandiye. Di sala 1982'an de lêkolîner û nivîskarê Kurd, Ehmedê Qazî ji helbestên wî, di pirtûka li Tehranê weşandî de beşek ji helbestên wî dayîne çapê. Karê herî berfireh li ser jiyan û helbestên Kurdî yên Seyfulquzat ji aliyê Enwerê Sultanî û Hesenê Qazî ve hatiye berhevkirin. Di dawiya sala 2008'an de, ew xebata hanê di pirtûkek ji 423 rûpelan de ji aliyê "Binkey Jîn" li Silêmaniyê, li Kurdistana Îraqê bi navê "Azadî, Serbexoyî, Mîrî û Gewreyî/ Dawa biken be zar û ziman û didan û lêw, Jiyan û ê're Kurdiyekanî Seyfulquzatê Qazî" hatiye çapkirin. Wî bes bi Kurdî tenê helbest nenivîsîne. Wî bi zimanê Farisî, Erebî û bi Tirkiya Azerbaycanî jî, helbestên xwe bi çar zimanan nivîsandine. Renge di pêşerojê de dîwana wî ya helbestên Farisî dibe ku ji aliyê berhevkar Enwerê Sultanî û Hesenê Qazî ve bête weşandin.

Mîrza Hesenê Seyfulquzat di despêka sala 1945'an de, li pêş damezrandina Komara Kurdistan li Mehabadê, çûye ser dilovaniya xwe.

Mîrza Hesenê Seyfulquzat, apê Pêşwa Qazî Mihemed e. Ew bavê Muhemed Husên Seyfî Qazî ye. Seyfî Qazî jî, wek tête zanîn Wezîrê Parastina Komara Kurdistanê li Mehabadê bû. Seyfî Qazî jî, li 30'ê Adarê sala 1947'an de, ber destê sibê bi Pêşewa Qazî Mihemed û birayê wî Sedrî Qazî ve li ciyê komar lê hatî îlankirî, ew her sê mirovên bi rûmet û bi qedr û qîmet tên sêdaredan (dardakirinê)!..

Dîsa di nav wêjevanên Kurd yên tên nasîn de, ji wana yek jî, Dr. Rehîm Qazî ye, ku kurekî din yê Seyfulquzat e. Romana Rehîm Qazî "Pêşmerge" yekem romana Kurdî ye, ku bi zaravaya Kurdiya Navîn (Sorani) ku hatiye nivîsandin. Ew Roman cara yekê bi xeta kirîlî li Rewanê hatiye çapkirin û di sala 1962'an de jî, li Bexdayê derketiye. Roman bi Kurmanciya Jor jî derketiye.

Wusa xuya dibe ku di malbeta Mîrza Hesenê Seyfulquzat de bes ne tenê di aliyê rêzanîya netewetî de wek nemir Pêşwa Qazî Mihemed siyasetvan, gellek jî zana, wêjevan û helbestvanên payebilind jî, di wê malbetê de derketine. Ji dîwana helbestvanê mezin yê Mîrza Hesenê Seyfulquzat du helbestên wî yên dirêj, her çiqas ew bi zaravayê Soranî hatibin nivîsîn jî, ew helbestna wek zaravayê Kurmancî jî têne fehmkirin û têne xwendin. Ew jî bi ew zimanê xwe yê sade, bi ew Kurdiya xwe ya zelal wek zarê Eliyê Herîrî û Feqiyê Teyran helbestan dinivîsîne û helbest de hostatiya xwe ya mezin bi bêjeyên Kurdî dixemilîne...

Ji helbesta wî ya dirêj bi navê "ZISTAN" çend bend li jêr in:

**ZISTAN**

Ezîz! arezût zorî bo hênam
Firmêskim sûr bû, zerdî rûy lênam

Dîsan be awrî dûrît kewtime gîr
Dinyam lê sard bû, bû zimherîr

Dinya hênd pir bû le befr û sîxwar
Firmêskî sûrim be sipî dêne xwar

Ta nahumêd bûm le hatinî zût
Cergim bûwe polû, henasem bizût

Hewa be hallim wek kêwan degirî
Be terze û befr û baran û hewrî

Erzîş le bo min hêndî qurr pêwa
Beharî le gel zistan lê şêwa

Giya û golî mêrgan bom sîs û zerd bûn
Bo şînî kêwan, kewan hemderd bûn

........................

Şemal û ziryan dayîm şerryane
Axawet şirrin, kirmanc qirryane

Roj heta şewê, gewre û piçûkyan
Xêzanî malê, gewre kiç, bûkyan

Xerîkin le bax firîzû derdênin
Wek şewnimî gull areq derjênin

Areq le henyan berîz bijmêre
Kê dî le 'asman be roj estêre?

Le dewrî seryan, desrokey hewrî
Wek mangî çarde, le nêwan hewrî

.................................

Zistanî ewsal diyare pênc mange
Merr û ka û giya û co, birra le dange

Naye fîtûy şuwan le ser şewênê
Mêgelan çêştan le kwê denwênê?

Kuwan şenge bêrî le çiya û kwêstanan
Şillqey meşkeyan berî beyanan

Qollyan hell deken delêy bilûre
Sîngyan derdexen, parçêk le nûre

Derezî berokyan ke dên derbênin
Roj le 'asmanê bo 'erzî dênin

..........................

Kere bozîşyan le ser westaye
Kullî giryanyan le ewkî daye

Taze mallekan daxuda çilonin ?
Ewanîş xerîkî firîzû û ka konin?

Dilit teng nebê, tifaqit hebê
Ewî toy newê, ya xwa qet nebê!

" 'Umer" û " 'Usman", " Bûbekir" î nazdar
Be naz gewre bin, haname çuwar yar

Cêjnî qurbane, xom qurban dekem
Cêjne pîrozey 'Ezîz giyan dekem

Tarîx hezar û sêsed û duwazde
Bîstî Ferwerdîn neçê le yade

www.amidakurd.org

agiri


**Duheftînameya siyasî, civakî, çandî û hunerî**
**Partiya Demokrat ya Kurdistana Îranê diweşîne**

**http://www.kurdistanmedia.com/kurmanci/index.php**
**Navenda bingehîn ya xebata Agirî li Kurdistanê ye.**
**Navnîşana derveyî welat:** AFK B.P. 102- 75623 Paris CEDEX 13 –FRANCE

**E - Mail:**
**agiri2003@hotmail.com**
**agiri2003@gmail.com**



# Çalakekî Siyasî Yê Kurd Bi Cezayê Îdamê Mehkûm Bû



Çalakekî siyasî yê Kurd bi navê **Enwer Rostemî,** xelkê bajarê Ciwanroyê, ji aliyê Dadgeha Şoreşa Kirmaşanê bi cezayê îdamê hate mehkûmkirin. Navhatî bi tometa endambûn di yek ji partiyên Kurdistanî de û têkdana dîsiplîn û ewlehiya neteweyî û her wiha beşdarî di xwepêşandanên ser şeqaman bona nîşandana nerazîbûnê derheq kuştina Şivane Seyîdqadirî, bi "Muharibe"(Şer tevî Xwedê) hate tawanbarkirin û bi amadebûna parêzerekê ku ji aliyê dadgehê ve jê re hatibû destnîşankirin, di dadgeheke çend deqîqeyî de bi cezayê îdamê hate mehkûmkirin.

Enwer Rostemî nêzîk du mehan berî niha ji aliyê hêzên Ewlekarî ên rejîma Îslamî a Îranê ve li bajarê Kirmaşanê hate binçavkirin û bo Ewlekariya Sipaha Pasdaran hate şandin.

Navhatî niha di girtîgeha bajarê Kirmaşanê de ye.

Heta vê gavê 16 çalakên siyasî û sivîl yên kurd li Îranê bi cezayê îdamê hatine mehkûmkirin.

# Enflasyona Aborî Ya Îranê, Şeşem li Cîhanê, Duyem li Rojhilata Navîn



Pilebendiya herî nû a cîhanê derbarê Enflasyona aborî di sala 2008'an de dide xuyakirin ku di nava 225 welatên cîhanê de, tenê 14 welat li jorî 15 ji sedê û tenê 29 welatan jî enfalsyona du hejmarî hene. Tê zanîn qasê hilawsana aborî ya 210 welatan, yê bûye yek hejmar.

Rapora Ajansa Zanyariyên Navendî ya Amerîkayê (SIA) derbarê qasê Enflasyonê di welatên cîhanê de nîşan dide ku Îran yek ji 6 welatên cîhanê ye ku herî zêde Enflasyona aborî heye. Di nava 225 welatan de, Îran di pileya 219 de cî girtiye. Di sala 2008'an de, qasê Enflasyona aborî li Îranê nêzîk 26 ji sedê bûye.

Di Rojhilata Navîn de tenê enflasyona aborî ya Îraqê ji Îranê xirabtir e. Ji ber jordebûna Enflasyona aborî li Îranê, karîna kirîna xelkê gellek kêm bûye.

# Ji Bo Pêncemîn Salvegera Serhildana Qamîşloyê Çalakiyên Berfireh Hatin Lidarxistin



Bi henceta pêncemîn salvegera serhildana 12'ê Adara 2009'an a Qamîşloyê, li Rojavayê Kurdistanê, Başûrê Kurdistanê û çend welatên cîhanê çalakiyên cur bi cur ên rêzgirtin û bibîranînê birêve çûn. Malperên înternetî ên Rojavayê Kurdistanê diyar Kirin ku Kurdên bajarên Qamîşlo û tavahiya bajarên din ên Kurdistana Sûriyê çalakî li dar xistin. Gel li Rojhilatê Kurdistanê ji bo goriyên wê bûyerê 5 deqîqe bêdeng rawest. Çalakî di bin çavdêriya tund a hêzên ewlekariya Sûriyê de birêve çûn.

## Şandeke PDKÎ Di Salvegera Serhildana Qamîşloyê De Beşdarî Kir

Şandeke Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê, demjimêr 15'ê piştînîvroya roja pêncşem, 12.03.2009'an, di rê û resma 5'emîn salvegera serhildana bajarê Qamîşloyê ku di hola Tewarî a bajarê Silêmaniyê de, ji aliyê Komîteya Hevpeymanî a Kurdistana Sûriyê ve hate lidarxistin, beşdarî kir. Şanda PDKÎ pêk hatibû ji Mihemed Sahibî, endamê Komîteya Navendî a PDKÎ û berpirsê pêwendiyên vê partiyê li bajarê Silêmaniyê û Fuad Xakîbêygî, Cihgirê Pêwendiyan di wî bajarî de. Di rê û resma han de serbarê pêşkêşkirina peyamên partî û rêxistinên Kurdistanî, çendîn helbest û pexşan ji aliyê helbestvanên Kurd ve hatin pêşkêşkirin û serhildana mezin a Qamîşloyê û şehîdên nemir yên vê serhildanê hatin bibîranîn. Rê û resma han demjimêr 17'ê êvariya wê rojê bi dawî hat.

# Tora Cîhanî Ya Înternetê Bû 20 Salî



Roja înê, 13'ê Adara 2009'an, Tora Cîhanî a Înternetê bû 20 salî. Bîst salan berî niha di a roja 13.03.1989'an de, "Tim Berners-Lee", Zanyarê navdar yê Înternetê û pisporê Komputerê bi alîkariya hevkarên xwe karî Tora Înternetê biafirînin.

Ev tore di destpêkê de bi armanca çêkirina pêwendiyê û veguherîna zanyariyên zanistî di navbera zanyaran de di seranserî cîhanê de pêk hat, lê piştî demeke kin ji bo hemû warekê hate bikaranîn û roj bi roj berfirehtir dibe.

www.arsivakurd.org